## Xalên giştî:

Eger tu bermaleyên (Subside, Leistung) li gorî SGB II'yê (Cilda Duyem a Qanûna Dabînkirina Civakî) (Arbeitslosengeld II / „Hartz IV“), SGB XII (Sozialhilfe) (Cilda 12an a Qanûna Dabînkirina Civakî) an jî AsylbLG (Qanûna Bermaleyan a Penaxwazan (Penaxwaz) werdigirî, pêwîst nake ku daxwaza xwe bi awayekî cuda ji bo bermaleyên têkildarî fêrkirin û beşdariyê raber bikî. Hevrê digel daxwaza te ya sereke, Bermaleyên BuT'ê (Fêrkirin û Beşdarî) jî wek daxwazkirî tên hesibandin (heta bi awayê lêvegera bo raboriyê ji dema raberkirina daxwazê). Ragihandina vê yekê ku Bermaleyên BuT'ê (Fêrkirin û Beşdarî) hewce ye (wek mînak geşt û gerra polê an jî navroj), têrê dike. Tenha babeta îstisna û awarte piştevaniya hînbûnê (Fêrkirina kesane û xusûsî) ye. Tenê ev babet divê beriya destpêkirinê bi awayekî cuda were daxwazkirin.

Wergirên Kinderzuschlag'ê (Alîkariya xerciya temamkirî ya zarok) an jî Wohngeld (Alîkariya xerciya malê) divê ji bo her zarok, nûciwan an mezinekî cewan, daxwazeke taybet raber bikin. Di vî warî da dibe ku hevdem çend Bermaleyên BuT'ê (Fêrkirin û Beşdarî) bi hev ra bên daxwazkirin. Daxwaz divê heta radeya pêkan di mehekê da were raberkirin ku tê da hewcetî an jî peredan heye. Ev daxwaz diare carinan bi awayekî lêvegera li raboriyê jî were raberkirin.

Ji kerema xwe hertim daxwaza bermaleyê ku wergirtina bermaleya zarok/nûciwan ji ber wê pêk tê, daxwaza pêvekê bike.

Eger tu neçar bûyî ku ji pêş va hin xerc û mesrefan bidî, ev xerc dibe ku ji aliyê me va bên dayîn.

## Têkilî:

**Mişteriyên Jobcenterê (Navenda Kar):**

Navenda Kar li navçeya Celle
Georg-Wilhelm-Str. 14
29223 Celle
Telefon: 05141 961-940
Faks: 05141 961-713
E-Mail: celle@jobcenter-ge.de
Online: jobcenter.digital

**Wergirên alîkariyên civakî, bermaleyên penaxwazan, alîkariya xerciya temamkirî ya zarok an alîkariya xerciya malê:**

Navçeya Celle
Sozialamt
(Rêveberiya
karûbarên Civakî)
– Fêrkirin û Beşdarî –

Navnîşana Postê:

Postfach 3211
29232 Celle

Navnîşan ji bo serlêdanê:
Am Französischen Garten 3
Zimmer 213
29221 Celle

Telefon: 05141 916-4080
Faks: 05141 916-4097
E-Mail: BuT@LKcelle.de

**Zanyariyên zêdetir û form li:**

www.landkreis-celle.de

www.jobcenter-ge.de/Jobcenter/Celle


Stand Oktober 2022

Landkreis Celle

jobcenter im Landkreis Celle

# Bermale ji bo Fêrkirin û Beşdariyê (BuT) li navçeya Celle'yê

## Zanyariyên taybetî dêûbav û zarokên wan û her wiha taybetî nûciwan û mezinên cewan li dibistanê an jî di halê fêrbûnê da




# Ji hêla aborî va guncan e!

## Kî van bermaleyan werdigire?

Pakêta Fêrkirin û Beşdariyê (BuT) pişta zarok, nûciwan û mezinên cewan ku li malbatên kêmderhat dijîn û

- Meaşa Bêkarbûnê ya II („Hartz IV“, SGB II), (Cilda duyem a Qanûna Dabînkirina Civakî),
- Alîkariya Civakî (Alîkarî ji bo dabînkirina debara jiyanê, derhata bingeh di serdema extiyarbûnê da û di rewşa kêmbûna hêza kar û pêşeyê da; SGB XII (Cilda 7an a Qanûna Dabînkirina Civakî),
- Bermaleyên ji bo Penaxwazan (AsylbLG),
- Alîkariya xerciya temamkirî ya zarok an jî
- Alîkariy

a xerciya

malê

Werdigirin, digire.

Her wiha xwendekar an kesên di halê fêrbûnê da ku diçine fêrgeheke teknîkî û pêşeyî, di rewşekê da ku**ti** mûçe û destmizdekê di kûrsa fêrkariyê da wernegirin, mafê xwe yê wergirtina BuT'ê hene.

## Çi cûre bermale (Leistung) hene?

### geşt û gerr û rêwîtî:

Xerciyên têkildarî geşt û gerrên yekrojî û rêwîtiyên çend rojî yên Navenda Lêmiqatebûna rojane ya Zarokan (Kita), dibistan an fêrgeha teknîkî û pêşeyî wek mînak roja geşt û gerrê, serdana şanoyê, gerra polê, danûstandina xwendekaran tên qebûlkirin.

Tenê ragihandina Navenda Lêmiqatebûna rojane ya Zarokan (Kita) / Dibistanê derbarê geşt û gerr an rêwîtiya polê hevrê digel hemû zanyariyên girîng radestî Jobcenter'ê (Navenda Kar) an jî navçeyê bike.

Em xerciyên têkildarî geşt û gerrê bi awayê rasterast li vediguhezînin hesaba te û xerciyên bo rêwîtiyê bi awayê rasterast vediguhezînin hesaba Navenda Lêmiqatebûna rojane ya Zarokan (Kita) an jî dibistanê.

## Piştevaniya Hînbûnê (Fêrkirina xusûsî û kesane)

Eger pirsgirêkek li dibistanê hebe, dibe ku Piştevaniya Hînbûnê (Fêrkirina xusûsî û kesane) were pejirandin. Şerta pêwîst ev e ku fêrkar an dibistan piştrast bike ku xwendekar hewcetî bi piştevaniya hînbûnê heye û bi vî karî dibe ku karîgeriya perwerdehiyê baştir bibe. Di vê rewşê da, em hesaba xwe digel piştevanê hînbûnê safî dikin. Tu dikarî form û kurtevenihêrînê ya dabînkerên Piştevaniya Hînbûnê li ser malperên me bibînî.

## Navroj

Xerciyên ji bo beşdariya di xwarina navroja komî li dibistanê an jî Navenda Lêmiqatebûna rojane ya Zarokan (Kita) bi qasî rasteqîn tên qebûlkirin. Helbet ev yek derbarê xwarina ku ji aliyê Kiyoska dibistanê an cihên weke wê va tên firotin, wek mînak Sandwîç, Pîzaya biçûk an jî Doner va nayê sepandin. Tenê belgenameyekê derbarê navnivîsandina ji bo navrojê û xerciyên îhtimalî raber bike. Em rasterast bi raberker ra hesaba xwe safî dikin.

## Pêdiviyên Dibistanê (alavên Dibistanê)

Di berdêla her sala perwerdehiyê da an jî pêka her xwendekarekî da, her sal di meha Sibat û Tebaxê da pere bi awayê yekcarî û giştî ji bo Pêdiviyên Dibistanê (wek mînak çenteya dibistanê, amûrên nivîsînê, alavên hesabê û matematîkê, karên destî û dîzayn û makîney hesabê ya berîkê) tê dayîn. Ji bo xwendekarên bin 7 salî û zêdetir ji 15 salî, me hewcetî bi gewahiyeke piştrastkirinê ya dibistanê heye. Bermale bi awayê rasterast bo hesaba te tên veguhestin.

## Veguhestina Xwendekaran (Xerciya Hatûçûnê)

Ji bo xwendekarên ji pola 11an û jortirê an jî fêrgeha teknîkî û pêşeyî (ne ku polên derbasbûna bo Kar û kûrsa yeksalî ya amadetiya bo kar) dibe ku xerciyên ji bo rêya hatûçûnê bo dibistana herî nêzik bên qebûlkirin. Hin hewcetî bi belgenameyên te derbarê xerciyên hatûçûna bo dibistanê yên rasteqîn, wek mînak bi rêya raberkirina bilêtên têkildar an aboneyê heye. Em xerciyên hatûçûnê bi awayê rasterast vediguhezînin hesaba te.

## Beşdariya Civakî (Çand, werzîş, hevkarî)

Bi mebesta dabînkirina derfeta têkiliya digel hevtemenan ji bo zarok û nûciwanan wek mînak çalakbûna li klûbê, hînbûna sazekî an jî beşdariya di demên betlaniyê da, bermaleyên temamkirî bi qasî 15 Euro û bi awayê gişt û yekcarî bi awayê mehane tên dayîn.

Ev bermale dikare bi awayê takekesî ji bo babetên xwarê were bikaranîn:

- Mafê abone û endamtiyê di warên werzîş, lîstin, çand û danûstandinan (wek mînak klûba Fûtbolê, Klûb awerzîşê),
- Fêrkarî di dersên hunerî da (wek mînak fêrkirina mûzîkê, koma Korê (Chor)),
- Çalakiyên rênimûnbûyî yên çandî (wek mînak serdana bajêr hevrê digel rênîşanderekî, serdana mûzexaneyê),
- Beşdarî di demên betlaniyê da (wwek mînak Şopgerî, demên betlaniyê yên xortan).

Me ji bo vê mebestê tenê hewceyî bi gewahiyeke endamtiyê an jî beşdariyê an jî belgenameyekê xerciyê heye. Bermale rasterast bo te tên raberkirin.